Bi Navê Xwedê

Bi Navê Xwedê

# Barana Hêstiran

## Sukeyne keçika Îmam Huseyn (a.s)

Ji bo grupa 10-15 salî

Barana Hêstiran
Nivîser: Mehdî Wehîdî Sedr
Amadekar: Komgeha Cîhanî ya Ehlê Beyt – Ninîsgeha Wergêrî
Lêkolîn: Muhemmed Hadî Yûsifî Xerewî
Wergêr: Mucteba Subhî
Derhênerê Wêne: Seyyid Muhsin Mûsewî
Wêne: Teyyibe Tewessulî
Grafîk: Şirketa Sîmaya Nûr a Kewser
Rengandin: Eşref Huseynî
Paşnêr: Mucteba Subhî
Weşanger: Weşanên Nîhal

Hz. Sukeyne di dewrana ciwanîya xwe de li Kerbelayê bû. Ew bi bav, birayê xwe û kesên dinên Ehlê Beytê re di wê gava biderd, êş û jan de li Kerbelayê bû. Hz. Sukeyne roja aşûrayê musîbeta bira, mam û pismamên xwe dît. Di xatirxwazîya dawî ya Îmam Huseyn (a.s) êdî nekarî tehemmul bike û gelek zêde girîya.

Bav çû meydanê û şehîd ket. Dijmin, konan talan kirin. Ehlê Beyt şeva yanzdehê Muherremê bi wehşet û tirs sibe kirin.

Gava ber bi Kûfê ve hereket kirin, ji ber qetilgehê derbas bûn. Sukeyne bedenê bavê xwe yê bixwîn hemêz kir û pê re jî şewata dile digot. Hz. Sukeyne ji banûyên bijarte yê dîroka Aşûra û cîhana Îslamê ye. Her dem navê Sukeyne bi navê Îmam Huseyn (a.s) û bimusîbetên roja aşûra re ye ku her dilê pak û selîm, mehzûn û her çavên azade jî girîyan dike.

Bûyera Aşûra qedîya bû. Dijminan malbata Hz. Huseyn êsîr girtîbûn û dibirin Şamê.

Li pêşya qafîleya êsîran, rimdaran serên pak ên şehîdan bi serê rimên xwe ve kiribûn û bi xwe re dibirin ku êş û kederên yên dû re mayîne bila zêdetir bike. Di nava êsîran de, qîza biqîmeta Îmam Huseyn (a.s) jî hebû. Hz. Sukeyne di nava malbata pak û paqij de xwedîyê cîhekî taybet bû. Ew banûyek pak, biteqwa, çavfire, egîd, biaqil û dilovan bû. Ji bavê xwe Hz. Huseyn (a.s) gelek hez dikir û ew jî ji Sukeyne gelek zêde hez dikir.

Gava gotinên bihez û mîhrîbanên bavê wî yê mezlûm diket bîra wê, çavên wê hêstir tijî dibûn, buxz qiriqa wê digivaşt.

Dema qafîleya êsîran gehîşt Şamê (navenda hikûmet ya Benî Umeyye bû), xelk wêra dijminê Ehlê Beytê û alîkarên Yezîd bûn, ji bona temaşa malbata Îmam Huseyn (a.s) li nav kolan û bajar de civîyan û îzdiham çêkirin. Dema xanim Sukeyne hezaran çavên namehrem bibûn şahidê musîbeta malbata Hz. Alî (a.s), dît. Axekî kûr kişand  ji çavên wê hêstir barîyan. Dû re ji rimdarê ku serê Hz. Huseyn (a.s) li balê bû re got: “Serê pak ê bavê min ji me dûr bike ku bila nava wî ji malbata wî zêdetir be. Bila xelk li serê mubarek ê Hz. Huseyn (a.s) binhêrin û bala xwe nedin malbat û herema Resûlê Xwedê (s.a.a)”.

Ew xanima giranbiha, di wê lehzeya gelek dijwar de jî miqatê kinc û hîcaba xwe bû ku mirovên namehrem bila rûyê wan nebînin. Zeman hêdî derbas dibû, derd û kul li qelbên şikyayî girantir dibû.

Girînên Sukeyne roja Aşûrayê dixist bîra wê. Lehzeyên şehadeta dost û birayên Îmam Huseyn (a.s) dihat ber çavê wê.

Gava Hz. Eba Abdullah Huseyn (a.s) tenê mabû û êdî cengawerekî din tunebû ku Ehlê Beyta Resûlê Xwedê (s.a.a) biparêze, dihat bîra wê.

Xanima Sukeyne ket bîra wan lehzeyên ku Îmam Huseyn (a.s) bang da û alîkarî dixwest û digot: “Gelo alîkarek heye ku alîyê me bike?” Fikirkirna wan lehzeyan mirovhejan û dilperat dile xanima Sukeyneyê dieşand û hêstirên wê diherikî û dilop dikir.

Kete bîra wê gava bavê wê bi lêvên ziwa û tenê, qesda berxwedan û şehadet dikir, ji bona cara dawîn xatirxwazî hate konên xanima. Di wê lehzeya dijwar de rondik ji çavên wê dibarîya, qafîleya êsîran ji nevbera civakê derbas bûn û gihîyan qesra Yezîd. Ew qesra ku bingeh û sitûnên wê li ser xwîna çêtirînê mirovan  hatibû danîn.

Yezîd, ew serokê xedar, gava çavê wî bi serên pak yên şehîdan ket, malbata Huseynî jî êsîr dît, gelek kêfxweş bû û bi wan cînayetên ku pê lewitî bû îftîxar dikir. Ji wan fermandarên dilhişkên xwe yên ku agir li mala Resûlê Xweda (s.a.a) xistibûn, aferin digot û kefa xwe pê dianî. Xanim Sukeyne dinihêrî ku ev kurê dijminê kevn ê Ehlê Bety, heqaret li serê mubarek ê bavê wê dike. Ewê dizanibû bi vî karê xwe mexseda heyfgirtinê ji Îmam Alî (a.s) hebû. Heman ew kesê ku bi zulfeqarê dijminên serkêş û muşrikên har kuştibû û avêti bû erdê.

Xanima Sukeyne jî mîna bavê xwe yê giranqedr Îmam Huseyn (a.s), lehzekî neket bin zilletê û bey’etê Yezîd nekir û bi Hz. Zeynul Abidîn (a.s), bi meta xwe ya dilovan Hz. Zeyneba Kubra re li hemberê pîsatîyên Yezîd ê cînayetkar sekinîn ku wî zalimî rezîl û riswa kirin. Peyama Kerbelayê li

hemû mirovên azad belav kirin û di vê rê de jî tehemmul û tebatên zêde kirin.

Nasname:
Nav: Amîne
Navê dê: Rubab
Leqeb: Sukeyne
Mêrê wê: Abdullah
Wefat: Sala 117-ê koçî

Nasname:
Qummî, Nefs'ul-Mehmûm, rûpel 527
Muqerrem, Sukeynetun bînt'îl-Huseyn (a.s), rûpel 14

Komgeha Cîhanî ya Ehlê Beyt, ji bo belavkirina çand ya Îslamî 48 cild berhem ji bo zarokên delal pêk anîye. Em ji dê bav, mamoste û xwedevanên hêja tika dikin ku nêrîn, pêşniyar û rexneyên xwe bi navnîşana jêr ve bişînin.
Navnîşan: Haznedar Mah. Şevketdağ Cad. No: 67/A Güngören / İstanbul
Tel: 0090 212 555 1 666
Faks: 0090 212 555 2 212
Malper: www.nihalyayinlari.com
e-mail: info@ nihalyayinlari.com